Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 927 26-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165


# Akademiya Jineolojî pirtûka xwe ya nû da nasandin

**Akademiya Jineolojî ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi şahiyekê pirtûka xwe ya "Bingehên dîrokî û siberoja şoreşa jinê" da nasandin.**



Akademiya Jineolojî hewl dide zanista jinê ya di dirêjahiya dîrokê de yên di tevahî civakên de bi rêya lêkolînên li ser dîrok, civak, çandê û hwd bide nasîn.

Akademiyê bi şahiyekê pirtûka xwe ya "Bingehê dîrokî û siberoja şoreşa jinê" da nasandin. Şahî li baxçeyê xwendinê yê Qamişlo bi amadebûna bi dehan endamên saziyên siyasî, çandî, hiqûqî, civakî û jinan hat lidarxistin.

Pirtûka "Bingehê dîrokî û siberoja şoreşa jinê" ji 613 rûpelan pêk tê û bi zimanê kurdî ye. Pirtûka ku ji 2016'an ve xebat li ser tê kirin, di naveroka xwe de li bersivên 4 pirsan digire. Zêdetirî 360 jinên ji tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bersivên van pirsan didin ku sûdê ji qonaxên jiyan û tecrûbeyên tê re derbas bûne wergirtine.

Akademiyê di dema lêgerîna li ser zanista jinê de bi gelek kesayetên leşkerî, siyasî, çandî û civakê yên herêmê re nîqaş kir ku analîzeke hûrgil li ser dîroka şoreşa jinê di civaka xwezayî de û heta Şoreşa Rojava- Bakur û Rojhilatê Sûriyê derxe. Pirtûka bersiva wan 4 pirsan dide ku (bingehên şoreşa duyemîn a jinan li Mezopotaymayê ye, çavkaniyên ku pirsgirêkên civak û jinên bi taybet ên li Rojava tên çareserkirin, asta bandora şoreşa Kurdistanê li jiyana jin û civakê, texmîn û bangên jinên Rojava di pêşerojê de)

Endama Akademiya Jineolojî Şervîn Nûdem li ser naveroka pirtûka "Bingehê dîrokî û siberoja şoreşa jinê" axivî û got, piştî gelek analîz û lêkolînên girêdayî sosyolojiya azadî û rastiya jinên Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin kirin, ev pirtûk hat çapkirin.

Şervîn da zanîn ku pirtûka nû çavkaniya lêkolînên zanistî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye û wiha domand: "Pirtûk, serdema neolotîk an jî civaka xwezayî weke şoreşa destpêkê ya jinan şîrove dike ku dîroka wê bi pirrengiya çand, ol û civakan heta dîroka îro berdewam dike."

Şervî diyar kir ku di pirtûkê de beşên civakî û jinan hene ku li ser ferzkirina zihniyeta mêrdestî, bandora wê li demokrasî, azadiya civakan di damezrandina neteweperestiyê de, parçekirina erdnîgariya Rojhilata Navîn û çawaniya çareserkirina wê diaxive.

Di beşa sêyemîn de pirtûk balê dikişîne ser bandora şoreşa Kurdistanê di damezrandina Tevgera Azadiya Kurdistanê li jin û civakê bi giştî de, her wiha balê dikişîne ser destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê.

Beşa dawî jî hêviyên jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên pêşerojê nîşand dide.

*ANHA*

# Kal û pîrên Alman xizan in



**Bêhtir ji sedî 20 mirovên di ser 80 salî re li Elmanyayê xizan in. Li gorî lêkolîneke nû, ji sedî 22,4'ê mirovên di ser 80 salî re feqîr in.**

Bêhtir ji sedî 20 mirovên di ser 80 salî re li Elmanyayê xizan in. Li gorî lêkolîneke nû, ji sedî 22,4'ê mirovên di ser 80 salî re feqîr in.

Wezareta Malbatê ya Federal ev lêkolîn eşkere kir. Li gorî lêkolînê, jinên pîr ji ber feqîriyê bêhtir mexdûr in."Weke pîvana feqîriyê lêkoleran got, kî mehê 1167 euro û kêmtir wergire, ew feqîr e. Ji sedî 80´yê civakê li gorî vê feqîr e. Lê ev rêje li nav kal û pîra gelekî zêdetir e û li cem kesên di ser 80 salî re digihîje ji sedî 22.4´ê. "Wezîra ji partiya Keskan Anne Spiegel got, "Hîç li rûmeta civaka me ya dewlemend nayê ku evqas mirov di nava feqîriyê de bin."

Wê ji bo newekheviya xizaniya jinên pîr û mêrên kal jî got, "Ev lêkolîn nîşan dide ka mûçeyên kêmtir, demên dirêj karkirina nîv wextî û navberdayîna karî çawa dikin ku di pîrîtiyê de çawa tesîreke xirab li jiyanan jinan dike."Rêjeya feqîriyê li rojhilat li gorî rojava, kêmtir e: li Rojava ji sedî 18.7´ê kal û pîran xizan in, li rojava ji sedî 23.7. Lê ka hikûmet wê li dijî vê çi bike, di daxuyanî nehatiye dayîn.

*Ozgûr Polîtîak*

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Endam | 1.Kesê ji komeke taybet: Endamê Koma Awazên çiya. Endamê partiyê. Endamê malbatê. Endamê gelekî. 2. Parçeyên bedenê: Mînak; çav û dest endam in. 3. Parçeyek ji tevayiya tiştekê. |
| Folklor (Fransî) | Zanista gel, zargotin, çîrok, helbest, stiran û govendên gelêrî. Hunera di nava gel de belav bûyî lê afrînerên wê nayên zanîn. |
| Komplo (Fransî) | Plana kesekî yan çend kesan li dijî kesekî, yan komekê, yan dewletekê. |
| Merasim (Erebî) | Dêlîndêz, rêûresm, ayîn, resmiyet, seremonî. Civîneke fermî ji bo pîrozkirin yan jî bîranîna kesekî yan bûyerekê: Ji bo bîranîna şehîdan merasimek hat lidarxistin. |
| Mêtîngeh | Kolonî, welatê yan devera dagîrkirî. Welatê biyanî tê de serdest in. |
| Mêtînger | Kesên mêtîngehan bi rê ve dibin, dagîrker. |
| Nivîsgeh | Bûro, ofîs, daîre, dezgeh: Em çûn nîvîsgeha kirîna xaniyan. |
| Pirtûk | Komek perên kaxizan yên binivîs yan biwêne yên di nava du bergan de hatîn çapkirin. Kitêb. |
| Proje (Fransî) | 1.Karekî diyarkirî yê ku piştî çend qonaxan diqede: Rêveberiyê ji bo bêkaran projeyek amade kiriye. 2. Plan, progrem, bername, amadekarî. Ti kes nizane ka plan û projeyên wî çi ne. |
| Şermezar Şermezarkirin | Şermezar: Kesên ketîn şermê, kesên ji ber kêmayiyên xwe şerm dikin: Ji ber ku bavê min dît ez cigareyê dikişînim, ez şermezar bûm. Şermezarkirin: Diyarkirina qebûlnekirina gotin yan kiryara kesekî yan hêzekê. Rûreşkirin: Welatiyan kuştina jinan şermezar kir. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | O | R | ■ | M | E | D | ■ | |
| 2 | Î | ■ | Ê | D | Î | ■ | O | F | ■ |
| 3 | ■ | E | B | A | ■ | M | ■ | A | A |
| 4 | E | ■ | E | ■ | X | A | L | ■ | R |
| 5 | T | Î | R | M | E | H | ■ | A | D |
| 6 | Ê | M | ■ | E | ■ | T | Î | P | ■ |
| 7 | ■ | H | E | W | Î | ■ | S | ■ | Z |
| 8 | X | A | N | Î | ■ | N | A | M | E |
| 9 | W | ■ | E | J | N | Û | ■ | Û | R |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | ■ | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | | ■ | | | ■ | | ■ | | |
| 6 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 7 | ■ | | | | | ■ | | | ■ |
| 8 | | | ■ | | | | | | |
| 9 | | | | ■ | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Di dîrokê de dewleteke Kurdan... Keriyê mî û bizinan
2. Teref... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropa
3. Rengek
4. Rengek
5. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tinekirin... Pirç
6. Keleşêr... Sarincên avê yên di binê erdê de
7. Çiyayekî me... Cînava kesê yekê ya yekjimar
8. Cînava pirsiyariyê ya ku tê wateya; li kû ye?... Rewşa derûnî
9. Ji vir û şûn ve, ji niha pê ve... Cihê heranê... Yezdanekî misrî

### JOR-JÊR

1. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Dîwarê ku ji xaliyê hatiye çêkirin... Pirsek di rewşa tewandî de
2. Cihê ku çûk û teyr lê datînin... Hilberîna tiştekî nedîtî
3. Notayek... Bajarekî me
4. Hêjmarek... Bi rûsî erê
5. Peyveke teşwîqkirinê... Vexwarineke bi alkol
6. Rêxistina polîsan ya Naziyan... Daçekek ku wateyê xurt dike... Kar û xebat
7. Serokê rohanî yê xaçparêzan... Dijberê rengî spî
8. Rengek
9. Hejmara du, çar, şeş, heşt û hwd.... Cer... Peyva neyînî

## Binyamîn Şekir :Li girtîgehan ya sûcdar û kojer dewlet bixwe ye



Hevserokê Giştî yê OHD got, rewşa girtîgehan pir xerab e, dermirovî û ne qanûnî ye. Jixwe li girtêgehên Tirkiyê yan stûxwarkirina ji dewletê re yan jî işkence û kuştin derdikeve. Bi taybetî li ser girtiyên nexweş mirin tê spandin. *R-4*

## 'Em bi biryardariya têkbirina dijmin li Kurdistanê dest bi sala 2022'yan dikin'



Çewlik diyar kir ku li ser bingehê serketinê, bi biryardariya têkbirina dijmin dest bi sala 2022'yan dikin. *R-2*


Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 927 26-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## Omer Ocalan: Dixwazin bi tecrîda girankirî birêz Ocalan ji rojeva gelan derxin



Tecrîda li ser Rêber Ocalan li girtîgeha Îmralî ku ji 99an ve dest pê kiriye, îro bi şêwazeke giran û dermirovî didome. Li ser wê Omer Ocalan got, gelê Kurd bi fikir û ramanên birêz Ocalan bûye xwedîhêz. Ji ber wê li Îmralî bi armanca dûrxistina gel ji Rêber Ocalan, konsepta tecrîda girankirî tê kirin. *R-5*

# DEWLET BÛYE KUJERA GIRTIYAN



## Tankên dewleta tirkî û çeteyên wê malên sivîlan dikin amanc



Ji ber bêdengiya hêzên navneteweyî bi taybetî yên garantor dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê êrişên ser herêmê û sivîlan dijwartir dikin. Birîndarê bi navê Elî Ehmed EL-Îd jî got, tankên dewleta tirkî malên sivîlan dikirin amanc. *R-3*

## Mala Jinê bi kar û xebata xwe ya salê bûye cihê çareseriyê



Pirsgirêk û êşên ku bi jinan re derbas dibin rojane diçin Mala Jinê. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan Mala Jinê gelek kar û xebat dane meşandin û bi taybetî îsal di nava kar de gelek zehmetî jî kişandine. *R-2*

## Rewşa çandiniyê û kêmbarîna baranê



Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çavkaniya sereke çandinî ye. îsal weke par hê baran baş nebariyaye û erd ziwa ye. Derbarê mijarê de Hevserokê Rêveberiya Çandinî û sewalkariyê ya kantona Qamişlo Ebdilbaqî Mûsa da zanîn ku heta niha ti cudayî di navbera rewşa par û ya îsal de nîne. Çimkî hê baran baş nebariyaye. R-6

## Wê ji bo jinên girtî xebata çîrokan bidin destpêkirin



MED-DER, PEN'a Kurd, Komeleya Wêjekarên Kurd, Enstîtûya Amedê û MED TUHAD-FED wê derbarê girtiyên jin de xebata çîrokan bidin destpêkirin. Di çarçoveya bernameyê de divê çîrok dawiya 8'ê Adara 2022'an, ji MED TUHAD-FED re bên şandin. R-7


## Li Şehba jimara nexweşên leşmanya zêde dibe



Endama rêveberiya Heyva Sor ya Kurdî ya herêma Efrînê Sekîne Erebo diyar kir ku di nava salekê de li Şehba jimara pêketiyên nexweşiya Leşmanya gihîşt hezar û 700'î. Herwiha bang li rêxistinên mirovî kir ku destpêkê alîkariyê li belavbûna nexweşiyê bigirin. R-6

## Şerê taybet çima pûçkirina civakê dike amanc

Li hemberî her şêwaza tekoşîn û berxwedana gelan, ji bo bêbandorkirin û bêîradekirina civakê herwiha guhertina îdeolojiya wê, şerê taybet bi amûrên serdestî û zordariyê li ser civakê tê meşandin. R-4




## 'Bi zindîkirina DAIŞê dixwazin herêmên dagîrkirî fireh bikin'



Mihemed Emîn : Vîn û berxwedana gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ji dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê mezintir e. *R-4*

# ‘Em bi biryardariya têkbirina dijmin li Kurdistanê dest bi sala 2022’yan dikin’

Çewlik diyar kir ku li ser bingehê serketinê, bi biryardariya têkbirina dijmin dest bi sala 2022’yan dikin.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Fermandara YJA Starê Zozan Çewlik teqez kir ku sala 2021’ê gerîlatiya moderniteya demokratîk hatiye ceribandin, hêlên xwe yên qels hatine tesbîtkirin, hêlên xurt jî hatine kûrkirin û wiha dewamî da gotinên xwe: ‘’Ev doktrîna şer ku em weke gerîlatiya moderniteya demokratîk jî bi nav dikin, wê ji bo hemû gelan, jinan û hêzên dijî pergalê bibe perspektîfa sereke.’’

Beşa duyan ya hevpeyvîna bi Fermandara Biryargeha Navendî ya YJA Starê ya bi ajansa ANFê re kirî bîlançoya salê ya YJA Starê hat diyarkirin û ji bo sala nû banga têkoşîna azadiyê li hemû gel û jinên cîhanê yên li dijî dagîrkerî û deshelatê kir.

Çewlik bîlançoya salê wiha diyar kir:

* Îsal 114 hevalên jin şehîd bûn.
* 5 gerîlayên jin dîl hatin girtin.
* Hêzên me yên YJA Starê 116 çalakî li dar xistin.
* 25 çalakiyên sabotajê,
* 22 çalakiyên sekvaniyê,
* 24 çalakiyên bi çekên giran,
* 13 çalakiyên bi çekên taybet,
* 2 çalakiyên avêtina ser dijmin
* Çalakiyeke êrişê
* Çalakiyeke kemîndanînê
* Yên din jî çalakiyên bi termal, çekên nîv otomatîk û ferdî hatin kirin.

Di encama van çalakiyan de ev ziyan li dijmin hate kirin;

* 136 leşkerên dijmin hatin kuştin.
* Kontrayek û 2 cerdevan hatin cezakirin.
* 38 leşker birîndar bûn.
* 2 wesayitên zirxî yên bi tîpa Kîrpî hatin îmhakirin.
* Wesayiteke bi tîpa Amorog, wesayiteke bi tîpa Transît, wesayitek bi tîpa Reo, Qemyonek hatin îmhakirin.
* Derb li 5 helîkopterên êrişê hate xistin.
* Çekek A4, 17 çeper, stasyoneke bazê, mobesseyek, droneyek, kepçeyek hatin îmhakirin.

Çewlik wiha banga têkoşîna azadiyê li gel û jinên cîhanê yên azadixwa kir: “Bawer im ku sala nû ji bo gelan û jinan bibe sala azadiyê, banga min li hêzên li dijî sîstema deshilatdar têdikoşin dikin, ewe ku têkoşîna xwe hevpar bikin. Bêguman a ku salê nû dike, rêbaza me ya fikrî, nêrîna me ya li salê, wate û nirxên ku em didin salê ye. Têkildarî sala derbasbûyî li gel pirsgirêkên ku me çareser kirine, her wiha hin rastî hene ku me nekarî çareser bikin û ji sala 2022’an re hiştine. Rastiyeke ji aliyê her kesî ve tê qebûlkirin ku di sala 2021’ê de hêzên me bi rengekî mezin li ber xwe dan. Lê belê vê berxwedanê, metirsiya li ser Rêbertî û Tevgera me bi temamî beralî nekiriye.

Ji bo serketinê divê berxwedan tenê ji aliyekî ve neyê meşandin; divê li qadên siyasî, civakî, dîplomasî, çand û çapemeniyê jî Şerê Gel ê Şoreşgerî rojeva yekane be. Şerê gel ê Şoreşgerî ne şerekî welê ye ku tenê ji aliyê gerîla ve bê meşandin. Di nava salê de me nîqaşên li ser vê yekê gelekî kir û ji hin aliyan ve jî be hate çareserkirin. Beriya her tiştî ev êriş, êrişên îdeolojîk in. Wê demê têkoşîna me ya li dijî vê yekê, divê bi giranî bi îdeolojîk û rêbazên dewlemend be. Em ne di pêvajoyeke welê de ne ku ji rêzê nêzîk bibin. Ji ber vê yekê bi hêz, baweriya ji destketiyên têkoşîna me divê em bi îdîa dest bi saleke nû bikin.

Divê gelên Tirkiyeyî, gel û jinên cîhanê jî tevlî têkoşînê bibin

Beriya her tiştî rewşa Rêberê me hînê cidî ye. Di çarçorveya azadiya Rêberê me de pêkanîna çalakiyan wezîfeya sereke ya pêvajoyê ye. Di vê mijarê de ne tenê gelê Kurd an jî jinên Kurd, divê gelên Tirkiyeyî, gel û jinên cîhanê tevlî têkoşînê bibin. Divê polîtîkayên dejenerekirinê yên desthilatdariyê bi xurtî werin teşhîrkirin. Bi taybetî rêxistiniyên me yên bingehîn xwe li dora rojevên sereke bi rêxistin bikin, çalakiyan bikin. Şer, bêkarî, xizanî, fûhûş, sîxurkirin, polîtîkayên narkotîkê di dem û cih de teşhîr bikin û nêzîkatiyên alternatîf bi lezgînî pêk bînin. Divê em teqez destûrê nedin van polîtîkayan ên ku înkar û bênasnametiyê kûr dike û hewl dide nirxên me parçe bike, qirêj bike. Li gel vê yekê li dijî polîtîkayên faşîzmê divê ewlehiya gelê me û jinên me teqez bê misogerkirin. Di vê mijarê de hişyariyên



cidî yên Rêberê me hene. Lewma gelekî girîng e ku li gel afirandina hişmendiya xweparastinê, amûrên vê yekê jî bên avakirin û birêxistinkirin. Jin û gel divê li her qada jiyanê bêne birêxistinkirin. Divê wezîfeyên me yên sala 2021’ê nîvco man bêne temamkirin û em berpirsyariyên xwe bi cih bînin. Di serî de faşîzma AKP-MHP’ê divê em hêzên mêtinger faşîst hemûyan bi rengekî dîrokî têk bibin.

Em bi biryardariya têkbirina dijmin li Kurdistanê dest bi sala 2022’yan dikin. Em di wê baweriyê de ne ku wê serketin ya gerîlayên azadiyê, jin û gelên berxwedêr be.”

***Çavkanî ANF***

# Mala Jinê bi kar û xebata xwe ya salê bûye cihê çareseriyê

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Pirsgirêk û êşên ku bi jinan re derbas dibin rojane diçin Mala Jinê. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkan Mala Jinê gelek kar û xebat dane meşandin û bi taybetî îsal di nava kar de gelek zehmetî jî kişandine.**

Destpêka şoreşa Rojava, bi armanca rizgariya jinê ji bendên koletiyê Mala Jinê hat vekirin. Giringî da mefê jinê û hewl da ku mafê wê ji kevneşopiyên civakê yên paşverû û hişmendiya nijadperest biparêze. Jixwe ji avakirina wê hete roja îro gelek doz û pirsgirêk bi rengekî asayî çareser kirine. Herwiha di avakirina têkiliyên civakî de jî rolek baş lîstiye û bûye bingehê avakirina civakeke demokratîk. Di Mala Jinê beşa Rêveberiyê, Komîteya Lihevanînê û Arşîv hene. Herwiha Komîteya Lihevanînê ji sê jinan pêk tê, ku li ser pirsgirêkên jinê û malbatî yên ku tên ber destê wan disekinin. Di heman demê de ev jin di van dozan de zana û xwedîtecrûbe ne.

Rêvebera Mala Jinan ya bajarê Qamişlo Behiya Mûrad behsa kar û xebata Malê ya salê kir û wiha got: “Îsal ji aliyê kar ve zexteke pir giran li ser me hebû. Çimkî pirsgirêkên ku dihatin gelek jê pir zehemet bûn. Ji ber wê em di çareserkirina wan de pir diwestiyan. Gelek sedemên van pirsgirêkan hene, bi teybetî piştî nexweşiya Koronayê pirsgirêkên navbera jin û mêr, herwiha zarok û malbatê de zêde bûn. Pirsgirêkên ku berê ji me re dihatin zû dihatin çareserkirin, lê yên niha pir zehmet in û dereng tên çareserkirin. Jixwe awayê karê me wisa ye. Dema ku jin doza xwe radestî me dike, em her du milê dozê vedixwînin da ku agahiyan ji her du aliyan bigirin û pişt re yekbiyek bi her du kesan re hevdîtinê dikin, da ku pirsgirêk û gotinên wan piştrast bikin. Pişt re ji bo nîqşakirina pirsgirêkê her du milan bi hazirbûna Komîteya Lihevanîn tînin gel hev. Armanca me ew e ku pirsgirêk bi rengekî adil ji bo her du milan bê çareserkirin. Ji bo çareserkirina pirsgirêkê pêwîst e yekser di çarçoveya erdîngariya xwe de serdana komînê bike, lê dema ku komîn nikaribe çareser bike doz bi mohra komînê radestî me tê kirin. Em ji milê xwe ve hewl didin, ku tevayiya pirsgirêkan bi razîbûna her du milan çareser bikin û mafê wan wekhev bidin.”

Behiya da zanîn ku ji her rengî pirsgirêk tên gel wan û axaftina xwe wiha domand: “Ji her alî û ji her cureyê jiyanê pirsgirêk tên gel me. Pirsgirêkên jin û mêr, yên malbatî, zewicandina temenê piçûk, revandina ji malê, xiyaneta zewacê, zewaca ser jinekê re, şideta li ser jinê û bêparbûna jinê ji mîrasê malbatê hene. Dema ku em pirsgirêkên jinan dibînin em pir pê diêşin. Çimkî gelek jin hene, heta niha nizanin ka mafê wan çi ye û wê çawa parastina vî mafî bikin.”

### Perwerdekirina jin û civakê

Behiya Mûrad got, di vê salê de di nava kar û xebata xwe de me gelek perwede dan û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Tiştê herî girîng û pêwîst di jiyana mirov de perwerde ye, hem perwerdeya jinan hem ya civakê. Çimkî bi perwerdekirina civakê jin jî digihşje mafê xwe. Me li gelek akademî û saziyên rêxistinê, herwiha li nava tax û komînan perwerde dane. Dema ku em pirsgirêkekê çareser dikin, em wê dikin mijara perverdeyê. Ji bilî perwerdeyan me gelek pêngavên bi jinê ve girêdayî dane destpêkirin, bi taybetî pêngava têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê. Vê pêngavê heta heyvekê dewam kir û baş hat şopandin. Me Pêngava Parastina Zagonên Jinê jî pêk anî. Ev pêngav jî roleke baş lîst û çend xalên din li zagonê hatin zêdekirin.”

### Jimara pirsgirêkan û çareseriyên wan

Behiya Mûrad jimara dozên îsal ji wan re hatîn û yên çareser kirîn anî ser ziman û got, dozên hatîn evin:

-Nakokiyên navbera jin û mêr: 757 doz. Yên hatîn çareserkirin 282.

-Nakokiyên malbatî: 127 doz. Yên hatîn çareserkirin 80.

-Nakokiyên Giştî: 141 doz. Yên hatîn çareserkirin 67.

-Mîras: 32 doz. Yên hatîn çareserkirin 10.

-Deyn: 17 doz. Yên hatîn çareserkirin 5.

- Zewaca ser jinekê re: 113 doz. Yên hatîn çareserkirin 25.

-Zewicandina zarokan: 72 doz. Yên hatîn çareserkirin 41.

-Xiyaneta li zewacî: 9 doz. Yên hatîn ça-



reserkirin 2.

-Şidet û lêdan: 59 doz. Yên hatîn çareserkirin 19.

-Revandina ji malê: 51 doz. Yên hatîn çareserkirin 40.

Bi giştî dozên hatîn mala jinê 1603. Yên hatîn çareserkirin 634 in.

Rêvebera Mala Jin ya bajarê Qamişlo Behiya Mûrad di dawiya axaftina xwe de got, em bi hêvî ne di sala bê de tevayiya pirsgirêkên nehatîn çareserkirin çareser bibin û nakokiyên bi jinan re derbas dibin kêm bibin. Herwiha sala 2022’yan tundî û şideta li ser jinê jî bi dawî bibe. Wek Mala Jin heta em bikarin emê ji pirsgirêkan re cihê çareseriyê bin û mafê her kesî bidin.

# Pirtûka Antolojiya Êşên Jinan derket

**20 nivîskarên jin ên Kurd pirtûka Antolojiya Êşên Jinan (20 Jin 20 Çîrok) amade kirin. Ji nivîskarên pirtûkê Yasemîn Elban destnîşan kir ku jinên Kurd ji aliyê wêjeyê ve gelekî xurt in.**

Pirtûka Antolojiya Êşên Jinan (20 Jin 20 Çîrok) ji 182 rûpelan pêk tê. 20 nivîskarên jin ên Kurd bi 20 çîrokan di pirtûkê de gihand hev. Pirtûk ji aliyê wêjeya jinên Kurd ve weke berhemeke serketî tê nîşandan. Ji nivîskarên pirtûkê Yasemîn Elban ji ANF’ê re axivî.




Li ser fikrê pirtûkeke wiha û armanca wê Yasemîn Elban got, “Mixabin her jinek xwedî çîrokên bi êş û gelekî giran e. Me xwest ku bûyerên bi serê jinan hatiye, lê belê nedihate xwestin ku bê bîranîn û bê parvekirin, bi rû bi rûbûnê re vî barî sivik bikin. Hewl hate dayin ku jin hîn bêhtir bi xwe bawer bin û karibin bêjin ‘ez jî dikarim bikim’. Gelek êşên giran mîna destavêtin, tundî, destdirêjiyê ku berê bi serê wan ve hatî, lê naxwazin bi bîr bînin, mîna barekî giran li ser pişta jinan e.

Jinbûyîn tiştekî çawa ye? Jiyana bi rengê jinê çawa ye? Jin ku ji roja ji dayik dibe heta mirinê timî li hinekan dinihêrin, diparêzin gelo ji bo xwe çi dixwazin? Keda jinê çima nayê dîtin? Çima bi mêran re çarenûseke ku newekhev e parve dikin? Jin a ku bi hêza xwe dikarin cîhanê ji nû ve ava bikin, çima her roj digirî? Bersiva van pirsan û pirsên mîna van di van çîrokan de dikarin bêne peydakirin.”

Li ser pirsa “Ya ku 20 jin li hev civand çi ye?” Yasemîn Elban wiha axivî:

“Bêguman ne tenê 20 jin, êşên hevpar ên hemû jinan hene. Di vê pirtûkê de çîrokên ku qala êşa hevpar a 20 jinan dikin hene. Ya rast, pirtûkeke welê ye ku êşên jinan lê digihêjin hev. Ji ber vê yekê me navê pirtûkê kir ‘Antolojiya Êşên Jinan’. Armanca me ji weşandina vê pirtûkê ew bû; nîşan bidin ku jinên Kurd mîna li her qada jiyanê di wêjeyê de jî xwedî pênûseke gelekî xurt e.”

Li ser taybetmendiyên hevpar ên jinên di pirtûkê de li hev civiyane Yasemîn Elban got, “Taybetmendiyên taybet ên ku 20 jin li hev civand, çîrokên wan ên li ser êşên hevpar e. Bi sê zaravayên Kurdî çîrok hene. Nivîskarên me yên jin ji Rojava, Başûr, Bakur û dîasporayê tevlî bûn.”

Yasemîn Elban di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku pirtûk ji aliyê Melîke Altan ve ji bo weşanê hate amadekirin, Nesrîn Rojkan tevna têkiliyê danî û ji aliyê weşanên NA’yê ve hate weşandin.

Yasemîn Elban spasiya nivîskaran û her kesên di amadekirina pirtûkê de ked dane, her wiha spasiya weşanxaneyê kir û got, pirtûk li ser înternetê dikare bê kirîn.

***ANF***



# Wê ji bo jinên girtî xebata çîrokan bidin destpêkirin

**MED-DER, PEN’a Kurd, Komeleya Wêjekarên Kurd, Enstîtûya Amedê û MED TUHAD-FED wê derbarê girtiyên jin de xebata çîrokan bidin destpêkirin. Di çarçoveya bernameyê de divê çîrok dawiya 8’ê Adara 2022’an, ji MED TUHAD-FED re bên şandin.**

Lijneya Jinan a MED-DER’ê, Lijneya Jinan a Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Lijneya Jinan a Komeleya Wêjekarên Kurd, Lijneya Jinan a Pena Kurd û Lijneya Jinan a Federasyona Piştevaniya Hiqûqî ya bi Malbatên Girtî û Hukumxwaran re (MED TUHAD-FED) ya Amedê, ji bo jinên di girtîgehan de ne xebata çîrokan didin despêkirin, li saziya MED-DER’ê civîna çapemeniyê li dar xistin. Komeleya Jinan a Rosa, Navenda Mafên Jinan a Baroya Amedê û Lijneya Jinan a Hiqûqnasên ji bo Azadiyê(OHD) jî beşdarî daxuyaniyê bûn.

Di destpêkê de Sunay Aslan a ku di rêveberiya MED TUHAD FED’ê de cih digire axivî û diyar kir ku ji bo jinên girtî ku di şert û mercên xirab de li girtîgehan dimînin xebatek ji bo motîvasyonê didin destpêkirin. Sunayê anî ziman ku ew ji bo vê xebatê ku di esasê xwe de jinan di nav xwe de dihewîne li benda piştevaniyê ne.

Piştre Hevseroka Komeleya Wejekarên Kurd Sultan Yaray axivî. Sultan da zanîn ku li girtîgehan zext zêde bûne û wiha axivî: “Wekî tê zanîn her diçe tecrîd girantir dibe û rewşa girtiyan jî ber bi xirabûnê ve diçe. Me jî ji bo jinên girtî xwest xebatek bi vî rengî bidin meşandin û hest û dengen wan bidin bihîstin. Di vê pêvajoyê de pêwîste ku hemû kes bibe denge girtiyan.”

### ‘Mafên girtiyan yên herî mirovî tên binpêkirin’

Hevseroka MED-DER’ê Şîlan Elmaskan jî bi metna daxuyaniyê li ser vê xebatê agahî ragihandin. Şîlan da zanîn ku li girtîgehan bi hezaran mafên wan tên binpêkirin û got: “Wek tê zanîn, bi hezaran kurdên azadîxwaz, ji ber têkoşîna xwe ya azadiyê îro di zindanan de dîl tên girtin, dibin tecrîdê de ne û her cureyê îşkence û kiryarên li dijî mirovahiyê li wan tên kirin. Gelek ji wan, di encama van kiryarên hov de jiyana xwe ji dest didin, Tên kuştin, birîndar dibin û mafên wan ê herî mirovî tên binpêkirin. Ligel vê yekê, kurdên dîlgirtî, li zindanan jî ji her milî ve li ber xwe didin. Bi taybetî jî jinên kurd ên azadîxwaz çawa li derve li dijî her cureyê pêkanînên derveyî mirovahiyê li ber xwe dan, li zindanê jî ji her alî ve li ber xwe didin û têkoşîneke bêhempa dimeşînin. Bêguman, desthilatdarî, di zindanan de, êrişî zimanê kurdî jî dike. Li dijî zimanê kurdî jî bi awayên cuda astengî, zext û pêkanînên dijminane dimeşînin. Axaftin, name û berhemên kurdî ji gelek milan ve, bi rê û rêbazên rojanekirî tên qedexekirin.”

### ‘Girtî gelek berhemên kurdî saz dikin’

Şîlan diyar kir ku gelek girtî ji bo parastin û pêşxistina kurdî jî ked û têkoşîneke mezin didin û gelek berhemên kurdî saz dikin. Şîlan, wiha berdewam kir: “Bi taybetî jî jinên dîlgirtî. Lê sed mixabin, gelek caran berhemên wan an tên desteserkirin, an tên windakirin û an jî doz li wan tên vekirin. Piraniya berhemên wan ên ku bi hezar zor û zehmetî ji derve re tên şandin jî ji aliyê sazî û weşanxaneyên kurd ve bi sedemên cuda nayên weşandin. Em wek lijneya jinên ji saziyên ziman û wêjeya kurdî, hemû kiryar û pêkanînên li ser jinên kurd ên dîlgirtî û yên li ser zimanê kurdî şermezar dikin; bang û gazî li hemû sazî, dezgeh, derdorên azadîxwaz û demokrat, nivîskar, hunermend û li gelê xwe dikin ku li dijî van kirayaran têkoşîna xwe ji her alî ve bilind bikin, berxwedan û têkoşîna jinên kurd ên




dîlgirtî û hemû dîlgirtiyên azadiyê mezintir bikin, bi taybetî jî têkoşîna wan a parastin û pêşxistina zimanê kurdî li her derê bilind bikin.”

### ‘Divê çîrok dawiya 8’ê Adara 2022’an bên şandin’

Şîlan, wiha dawî li daxuyaniyê anî: “Herwiha, ji bo xwedîlêderketin û mezinkirina têkoşîna jinên dîlgirtî em wek saziyên ziman û wêjeya kurdî yên li jêr dixwazin berhemeke çîrokan ên ku ji aliyê jinên dîlgirtî ve hatine nivîsîn biweşînin. Ji bo vê jî em dixwazin, her jineke kurd a dîlgirtî ji me re bi zaraveyekî kurdî çîrokeke ku mijara wê serbest e binivîse û bişîne. Divê çîrok dawiya 8ê Adara 2022’an, ji MED TUHAD-FED’ê re bên şandin. Di heman demê de her jineke ku çîroka xwe dişine divê kurtejiyana xwe jî bişîne. Ev berhem dê bi sernavê ‘Çîrokên Jinên Berxwedêr ên Di Zindanan’ de bi riya berhemekê bê weşandin. Bi hêvî û baweriya ku dê jinên dîlgirtî bi çîrokên xwe tevlîbûneke xurt ji bo vê xebatê nişan bidin, berxwedana hemû dîlgirtiyên azadiyê bi rêzadarî silav dikim û dibêjim: Berxwedan û têkoşîna we berxwedan û têkoşÎna me ye.”

***JINHA***

# Komîteya TEV-ÇAND’ê ya PKK’ê astengkirina filmê ‘Ji bo azadiyê’ şermezar kir




**Komîteya TEV-ÇAND’ê ya PKK’ê, astengkirina nîşandana fîlmê ‘Ji bo azadiyê’ li Festîvala Filman ya Navnteweyî ya Silêmaniyeyê şermezar kir û diyar kir ku biryara qedexeyê zererê dide çand û doza azadiyê ya Kurdan.**

Komîteya Festîvalê ya Silêmaniyeyê, tevî ku fîlmê ‘Ji bo azadiyê’ bi xwe vexwend festîvalê, rojek beriya galaya Silêmaniyeyê bêhincet biryar da ku fîlm neyê nîşandan.

Komîteya TEV-ÇAND’ê ya PKK’ê nerazîbûn nîşan da û got, “Ji bo 5’emîn Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Silêmaniyeyê fîlmê ‘Ji bo azadiyê’ jî hate vexwendin, lê belê rojek beriya nîşandana fîlm, hate ragihandin ku ev fîlm ji bo festîvalê nehatiye qebûlkirin. Eşkere ye ku hinceta ji bo qedexekirinê hatiye nîşandan bêbingeh e û sedema esasî siyasî û madî ye. Raya giştî ya Kurd zane ku ev destwerdana di kêliya dawî de hate kirin, ji ber dewleta Tirk a mêtinger e.”

Daxuyaniyê wiha dewam kir: “Beriya du salan jî dewleta Tirk a faşîst nehiştibû fîlmê ‘Ji bo azadiyê’ li Silêmaniyeyê li sînemayan bê nîşandan. Li bajarekî Kurd ê weke Silêmaniye ku bi çand û hunerê tê naskirin, cihê xemgîniyê ye ku tiştên bi vî rengî bi serê fîlmekî Kurd hatiye anîn, di heman demê de dibe sedema hêrsê. Dewleta Tirk a mêtinger dijminê gelê Kurd e. Bi hemû derfetên xwe êrişî destketiyên gelê Kurd dike, wê êriş jî bike. Lê belê nêzîkatiya yên ku dibin amûrek ji van êrişan re û di nokeriyê de sînoran nas nakin, nayê fêhmkirin û nayê qebûlkirin.

Dewleta Tirk mîna gayê ku êrişê dibe ser şalê sor, çima êrişî vî fîlmî dike? Ji ber ku ev fîlm rûyê komkujer, barbar û bêpariya ji mirovahiyê yên dewleta Tirk a mêtinger teşhîr dike. Maskeyên li ber rûyê dewleta Tirk dixîne warê, rûyê qirêj deşîfre dike. Fîlm qala mafê xwerêveberiyê û têkoşîna xweparastinê ya gelê Kurd dike. Ev fîlm qala berxwedana gelê Kurd a ji bo azadiyê dike, qala lehengên vê berxwedanê dike. Ji ber vê yekê dewleta Tirk hewl dide ku vî fîlmî li her derê qedexe bike û nehêle li welatên cuda bê nîşandan. Baş e ev fîlm çawa li bajarekî Kurdan li Silêmaniyeyê ji aliyê hêzeke ku xwe weke Kurdistanî nîşan dide, li gorî daxwazên dewleta dijminê Kurdan û faşîst tê astengkirin? Hem li Bakurê Kurdistanê di berxwedana xwerêveberiyê de tu yê piştgiriyê nede, tu yê cihê xwe li gel negire, mîna ku ev têrê nake tu yê rabe nehêle fîlmê li ser vê berxwedanê bigihêje gel û ji ber xweranegirtina dijmin destûrê nede! Gelo ev ya qebûlkirinê ye? Aliyekî vê nêzîkatiyê heye ku bi hişmendiya neteweyî, bi feraseta demokratîk û hunerê bê vegotin?

Yên ku ji ber zextan nehiştin fîlm tevlî festîvalê bibe, nîşan dan ku çiqasî bêîrade ne, noker û xwedî ruhekî koletiyê ne. Eger ji ber sedemên siyasî û di berdêla derfetên madî de helwesteke bi vî rengî nîşan dabin, hingî rewş hîn metirsîdar e. Eşkere dike ku ev hêz çiqasî dûrî ji berjewendiyên neteweyî ye, li gorî berjewendiyên xwe yên sivik tevdigerin.

Lehengiya ku ev fîlm qalê dike, ji bo tevahiya gelê Kurd rûmet e. Mîrateyeke çandî û dîrokî ya mezin e. Çavkaniya rûmetê ji bo her Kurdên azad e. Ji ber vê yekê her Kurdên alîgirê azadiyê divê xwedî li vê bexwedanê û li vî fîlmê li ser vê berxwedanê derkevin. Ji bo yên ku li Silêmaniyeyê li pêşiya tevlîbûna li festîvalê bûne asteng jî şerm e. Divê ev şerm neyê nixumandin. Raya giştî ya Kurd divê vê helwesta nokerî û bêkarakter teşhîr bike, helwestê li dij nîşan bide. Eger raya giştî ya Kurd di vê mijarê de bi berpirsyarî tevbigere, di dema xwe de refleksê nîşan bide, rexne bike, hingî dikare li pêşiya helwestên bi vî rengî yên dema bê bigirin, ku zerarê dide doza azadiyê ya gelê Kurd.

Em vê helwesta ku fîlmê ‘Ji bo azadiyê’ asteng kiriye bi hêrs şermezar dikin û diyar dikin ku ev yek zerarê dide çand û hunera Kurd, zerarê dide doza Azadiyê ya Kurd. Em bang li gelê xwe û raya giştî ya demokratîk dikin ku bi hestiyarî tevbigerin.”

***ANF***

# Ji Hunergeha Welat klîba ‘Awazên Wendayî’

**Hunergeha Welat ku li rojavayê Kurdistanê xebateke girîng ya hunerî dike, bi beşdariya 125 stranbêjan klîba “Awazên Windayî” bi 6 zimanan amade kir.**

Hunergeha Welat li Rojavayê Kurdistanê (Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê) xebatên girîng ên hunerî dike. Stran û klîbên girîng amade dike. Hunergeha Welat vê carê bi strana “Awazên Windayî” rengîniya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku rengê gelan e vegot.

Hunergehê bi 6 komên hunerî yên ji 125 stranbêjan pêk tê bi 6 zimanan klîbek hevpar amade kir. Di klîbê de stranên kurdî, erebî, ermenkî, sûryankî, tirkî û çerkezî hene. Derhêneriya klîbê Bêkes Darî û Delîl Mîrsaz kirine.

***JINHA***



# Rewşa çandiniyê û kêmbarîna baranê

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çavkaniya sereke çandinî ye. Îsal weke par hê baran baş nebariyaye û erd ziwa ye. Derbarê mijarê de Hevserokê Rêveberiya Çandinî û sewalkariyê ya kantona Qamişlo Ebdilbaqî Mûsa da zanîn ku heta niha ti cudayî di navbera rewşa par û ya îsal de nîne. Çimkî hê baran baş nebariyaye.

**Darîn Silê/Qamişlo**




Xweza û axa herêmê ji çandiniyê re baş e. Lê ji ber derengmayîna baranê û kêmbûna wê, li bakur û Rojhilatê Sûriyê çandinî dereng dimîne. Ev bandoreke neyînî li aboriya herêmê û cotkaran dike. Bi taybetî ziyan li cotkaran pir dibe, çimkî jêdera sereke ya ku debara xwe pê dikin çandinî ye. Ebdilbaqî Mûsa got, eger baran baş nebare wê rewşa çandiniyê bi taybetî zeviyên bejî ber bi xerabiyê ve biçe û axaftina xwe wiha domand: "Sala çûyî çandinî bêberhem bû, saleke hişk û ziwa bû. Çimkî baran nehat, zevî tev hişk bûn û ji bilî çêreya sewalan ji tiştekî re nedibûn. Wê demê zirar li aboriya herêmê û çotkaran hat kirin. Ji bo ku îsal ev tişt dubare nebe, me heziriyên xwe kirine. Eger baran kêm be emê giraniyê bidin zeviyên avî û alîkariya cotkaran bikin. Niha cotkarê ku bixwaze bîrê bikole em jê re erê dikin, da ku pîvanên xwe mezintir bike û hê zêdetir zeviyên xwe av bide. Li gorî şert û mercên çandiniyê em derfetê didin çotkaran. Heta niha me destûr daye gelek çotkaran ku bîrên xwe bikolin. Jixwe saziya tov jî îsal pîvanên xwe firehtir kirine û li gorî peymana bi çotkaran re çêkirî tov dide wan. Berê pîvana tov 60% bû, Îsal 70% ye. Cotkarên ku peyman bi me re çêkirine, em alîkariya wan jî dikin hem ji aliyê tov hem jî ji aliyê mazotê ve. Heta niha jî mazot û semad li çotkaran tê belavkirin. Rewş heta niha baş tê meşandin tenê kirîzeke mazotê hebû ew jî hat çareserkirin."

Ebdilbaqî behsa her du cureyên çandiniyê kir û wiha got: "Zeviyên bejî li ser barana demsala zivistanê ne û yên avî jî li ser ava bîran, bendav û çeman in. Lê îsal eger baran weke sala çûyî kêm be, wê zeviyên bejî bêsûd bin. Ji ber wê em zêde giraniyê didin çandiniya avî. Herwiha Rêveberiya Xweser alîkariyê dide cotkarên ku çandiniya avî dikin da ku ji zeviyên xwe sûdê bigirin."

Ebdilbaqî Mûsa encama civînê wan ya salê anî ziman û axaftina xwe wiha qedand: "Weke her sal civîna




me ya çandiniyê hat lidarxistin. Tê de gelek pirsgirêkên çotkaran û çareseriyên wan hatin nîqaşkirin. Yek ji encamên civînê ew bû ku beşê çandiniyê bibe wezaretek bi serê xwe. Herwiha nîqaşa peydekirina dermanan, afirandina cureyên nû ji çandiniyê re û qanûna parastina erdan hat nîqaşkirin."

Her sal di dema çandiniyê de cotkar dest bi karê xwe yê çandiniyê dikin û li hêviya hatina baranê dimînin. Cotkarê bi navê Mesûd Ridwan ku 20 sal in karê çandiniyê dike wiha axivî: "Îsal min 160 donim genim çandiye. Lê ji ber îsal baran pir direng ma, zeviyên me ziwa man. Pêwîst bû Rêveberî mazotê zû belav bike da me erdê xwe zû av bida. Derngmayîn û kêmbûna mazotê jî bandorê li çandiniyê dike. Eger mazot hebûya derngiya baranê ewqas zirar nedida çandiniyê. Dema mazot û semad di dema xwe de peyda be berhema çandiniyê jî wê baştir be û wê bandora baranê jî kêmtir be. Ji bo wê daxwaziya me ew e ku dema baran neyê mazot di dema xwe de bê belavkirin ku zevî bi giştî bêberhem nemînin."

# Li Şehba jimara nexweşên Leşmanya zêde dibe

**Endama rêveberiya Heyva Sor ya Kurdî ya herêma Efrînê Sekîne Erebo diyar kir ku di nava salekê de li Şehba jimara pêketiyên nexweşiya Leşmanya gihîşt hezar û 700'î. Herwiha bang li rêxistinên mirovî kir ku destpêkê alîkariyê li belavbûna nexweşiyê bigirin.**

Şer û bermahiyên wê ku herêmên Şehba dorpêç kirine û kombûna kavil û hebûna, qirêjî bû sedema berbelavbûna nexweşiya leşmaniya di nava koçberên Efrînê û şêniyên Şehbayê yên kamp û xaniyên wêrankirî de.

Li gorî Heyva Sor a Kurd, di 2019'an de hejmara nexweşên Leşmanya gihaşt 3 hezar û 92, di 2020'an de hezar û 191 û di 2021'an de nêzî hezar û 700 ji tevahî temenan.

Êşa koçberên Efrînê bi ambargoya hikumeta Şamê li ser herêmê û rêgirtina li pêş derbasbûna derman û madeyên bijîşkî re zêde dibin, bi her derbasbûna derman û madeyên tenduristî re bendên kontrolê yên hikumeta Şamê ku di navbera bajarê Helebê û Kantona Şahba de ne pereyan dibin.

Heyva Sor a Kurd tevî derfetên wê yên kêm, derziyan ji nexweşên leşmanyayê re peyda dike, da ku rê li ber belavbûna nexweşiyê bigire.

Sekîne Erebo destnîşan kir ku du cureyên nexweşiya leşmanya hene, di binçerm û çerm de. Çerm ya herî zêde li Şehbayê belav bûye. Heyva Sor a Kurd hemû nexweşên bi Laşmaniya çermê pêşwazî dike. Eger du sê şop li ser laşê kesê nexwş hebin, ew derziyê didin û eger zêdetirî çar şop li laşê nexweş hebin, ew ni-



karin li hemû şopan dirziyê bidin, ji ber vê yekê ew kesên nexweş dişînin bajarê Helebê da ku bên dermankirin.

Sekîne Erebo bal kişand ser astengiyên li kantona Şehba ji ber kêmbûna dermanan û got: "Em di peydakirina dermanên pêwîst ên ji bo dermankirina kesên bi leşmanya re gelek zehmetiyan dikişînin rû bi rû ne, ji ber ku hikumeta Şamê dorpêçeke giran li ser şêniyên Şehbayê ferz kiriye û rê nade ku kamyonên dermanan bikevin herêmê."

Sekîne Erebo da zanîn ku tu rêxistinan alîkarî pêşkêşî wan nekiriye û ev tişt anî ziman: "Çar sal di ser koçberbûna şêniyên Efrînê re derbas bûn û me tu însiyatîfeke mirovî ji rêxistinên navneteweyî ji bo pêşkêşkirina alîkariyên bijîşkî nedîtine."

Sekîne Erebo da xuyakirin ku Heyva Sor a Kurd ji bo pêşîlêgirtina li nexweşiya leşmanyayê bi hemleyên hişyarkirinê alîkariya mirovan dike û got: "Em li heft navendên xwe yên kantona Şehbayê ji bo naskirina nexweşiya leşmanya rê û rêbazên veguhestina nexweşiyê û pêşîlêgirtina wê, hemleyên hişyarkirinê li dar dixin."

Sekîne Erebo di dawiya axaftina xwe de bang li rêxistinên navneteweyî kir ku ji bo rê li ber belavbûna nexweşiyê bigirin, alîkariyên tenduristiyê bidin.

***ANHA***

## PKK E JI BO HEMÛ GELÊ ROJHILATA NAVÎ BÛYE ÇAVKANIYA HÊVIYÊ

**Rûstem Başûr**



Bêguman her tevgerekî ku di Rojhilata navîn de radibe, li ser mîrateyekî radibe. Gelek tevger avabûne ku bikaribin civakbûnê bi dest bixwin û azad jiyan bikin. Tevgerên kurdan jî di dîrokê de çi bi riya eşîran, çi jî bi riya kesayetan û rêxistinên navdar yên wekî Şêx said, Siyid riza bi pêş ketine. Lê dema ku mirov li van tevgeran temaşe dike, her dayîm bi riya îxanetên ku nava wan de çêdibe, hatine tepisandin û ji holê hatine rakirin. Lê rastiyekî domdare ku kurdan ti carî li beramberî xeta îxanetkaran serê xwe netewandine, û berxwedanî ji bona xwe bingih girtin e.

PKK e jî xwe li ser van mîrateya bi rêxistin kir. Mirov dikare bibêje, ku bi avabûna tevgera PKK ê re gelê kurd baweriyekî mezin qezenc kir, ku bê hevîtiya berê nema jiyan kir. Tam berovajî vê ji bona xwe çanda berxwedan û gehremantiyê her roj zêde dibû. Hema gelê kurd bû meseleyekî cîhanî ku rojane li ser axeftin tê kirin. hêzên dagirker yê mîna tirkê bawer dikir ku tiştek bi navê kurd û kurdistan di holê de nemaye. Lê belê nizanîbûn ku tevgera PKK ê ji wan şaştiyê dîrokî encamekî mezin derxistiya.

Pêvajoya ku tevgera PKK ê derketa holê, bi navê kurd û kurdistan tiştek nînbû ku li cîhanê pê kurd werin nasîn. Dema ku xwe damezirand li gorî şert û mercên wî demî bi rola rêxistinê ve rabû. Li ser bingiha kurdistanekî ser bixwe, di cîhanê de gelek pêşketinên giran bi xwe re da avakirin.

Gelek kesimên ku digotin ev rêxistin ango tevgera PKK ê wê heya demekî li berxwe bidin, ji demekî û şûnde wê qabîleta wan ya berxwedanê nemîne. Bi serê xwe ev gotin di henasa gelê kurd de bê hêviyekî dida avakirin. Lê bi demê re dîtin ku tevgera PKK ê naşibe tevgerê birciwazî yên tenê bi peyî desthilatiya xwe ve ketine. Dîtin ku PKK e rêxistineke li ser bingihê azadî, wekhevî, adalet û vegerandina nasnameya civaka kurde de, ji bona wê her roj xwe di dilê mirovahiyê de bi cî kir û bandoriyekî mezin li gelê cîhanê da avakirin.

Di peradîgmeya Rêber APO de sê lingên esasî hene, yek moderníteya demokratîke, ekolojîk û azadiya jin e ku Rêber APO di şexsê PKK ê de pêşkêşî hemû mirovahiyê hate kirin. Lê hêzên amperyalîst ji fikirên Rêber APO ditirsin ji bona wê ye ku tecrîdê giran kirî li ser Rêber APO didine meşandin. Sedemên tevahî êrîşên hovane tirsa fikira Rêber APO ye. Li vir pirs ew e gelo çima? Ji ber civaka kurd di serî de tevahî civakên Rojhilata Navîn û cihanê peradgma Rêber APO dipejirînin û weke çareseriyekî li dijî pergala Kapîtalîzim dibinin. Ew jî dizanim ku kesimên sosyalîst, demokratît, xwendekar û kesên bindest, ê ku mafên xwe dixwazin û berê xwe didine peradîgmeya nûjen ya ku bi destê Rêber APO hatiya afrandin. Hêzên serdest vê jî ji bo pergala xwe xeter dibînin. Ji bona wê çi ji destê wan tê li hemberî gelê kurd û tevgera wê ya azadîyê PKK ê dikin.

Dibe ku halê hazir kesê li dijî PKK ê şer dike dewleta tirk be, lê pîwîstî heya ku baş were zanîn ku yên pişgiriya dewleta tirk û pergala wê dike hêzên cuda yen mîna NATO ye. Êrîşên ku bi şêwazên tektîkî û bê ahlaqî li dijî PKK ê didine meşandin. Pîwîst e ji her demî zêdetir were zanîn ku kesên li dijî vê sîstemê şer dikin û li ber xwe didin milîtanên PKK ê ne. Li hemberî êrîşên qirker yên faşîzan berxwedanekî bi heybet ji milên tevgera azadiya kurd PKK ê ve tê meşandin, ev jî li cîhanê deng vedaye û ji bona dewleta tirk bûye windahiyek. Dijminên kurdan îdî hatiya astekî wisa ku tehemûla wî li hemberî tevgera PKK ê nemaye, lewma mecbûr bûye ku desteka xwe ji îxanetkaran yê mina mala berzanî bigire pîwîst e were zanîn ku hevkariya mala berzanî bi dewleta tirk re mehkûmî binketinê bûye û ti carî wê gelê kurd vê xiyanetê bîr neke.



# QSD`ê têkildarî erebeya bombebarkirî daxuyanî da

Li bajarokê Deşîşe yê gundewarê Hesekê QSD`ê erebeyeke bombebarkirî ya çeteyên DAIŞ`ê bêbandor kir. QSD`ê ragihand ku DAIŞ, hemwextî êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li herêmê van hewldanan dike.

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) têkildarî bêbandorkirina erebeya bombebarkirî daxuyanî da. Daxuyanî wiha ye:

"Di 22`yê Kanûnê de yekîneyên taybet ên QSD`ê erebeyeke bombebarkirî ya çeteyên DAIŞ`ê li bajarokê Deşîşe bêbandor kir ku şaneyên veşartî yên terorîst hewl didan wê bigihînin Hesekê û li wir biteqînin.

Yekîneyên me gelek hewldanên terorîst ên DAIŞ`ê li Hesekê, Ebû Xeşeb û Reqayê têk birin.

Hemwextî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çeteyên DAIŞ`ê van hewldanan dikin. Lê hêzên me amade ne, li hember wan êrişan bisekinin û gelê xwe ji hemû xeteriyan biparêzin."

***ANHA***



# Tankên dewleta tirkî û çeteyên wê malên sivîlan dikin amanc

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**



**Ji ber bêdengiya hêzên navneteweyî bi taybetî yên garantor dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê êrişên ser herêmê û sivîlan dijwartir dikin. Birîndarê bi navê Elî Ehmed EL-Îd jî got, tankên dewleta tirkî malên sivîlan dikirin amanc.**

Dewleta tirkî li ber çavê dewleta garantor komkujiyan dike

21 û 22ê Kanûnê dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê bi tank û topan êrişên xwe yên ser bajarokê Til Temir, Zirganê û gundewerê wan, dijwartir kirine. Di encama êrişan de Melka El-îd, Fesla EL-Îd, Salih Hemîd û Mihemed Iliyan şehîd bûn. Herwisa ji sivîlan û leşkerên Hikûmeta Şamê jî birîndar çêbûn. Hêjayê gotinê ye ku dewleta tirkî ya dagîrker, ji ber bêdengiya hêzên navneteweyî û li ber çavê Rûsyaya garantora peymana 22yê Cotmeha 2019an êrişên xwe yên bejayî bi destê çeteyên bi navê Cebhet EL-Nusra û bi balafirinên bêmirov ji Şehba heta Kobanê, Til Temir û Qamişlo li ser sivîlan komkujiyan dike.

Elî Ehmed EL-Îd (45) ku dayîk û xwîşka wî (Fesla EL-Îd e, Melka EL-Îd) di êrişê de şehîd bûne û ew, hevjîn û sê zarokên xwe jî li gundê Rebîatê birîndar bûne, ji rojnameya me re axivî.

Ehmed diyar kir ku li gel malbata xwe li mala xwe bûn. Danê êvarê li ser Zirgan, Mihrmela û pişt re li ser gundê Rebî`at bi tank û tobên êrişê dest pê kiriye û axaftina xwe wiha domand: "Çeteyên Tirkiyê ketober û bi dijwarî hawîrdor topbaran kirin û rasterast malên gundiyan dikirin amanc. Ji ber wê xweparastina gundiyan zehmet bû. Min dixwest hevjîn û zarokan bibim cem mala dêbavên xwe. Jixwe xwşîka min jî li cem wan bû. Dema em derketin hewşê topek li kêleka mala me ket û di encamê de ez, hevjîn û sê zarokên xwe birîndar bûn. Pişt re me hewl da ji gund derkevin. We-



saiteke tenduristiyê em gihandin nexweşxaneya Qamişlo."

`Dayîk û xwîşka min bûn amanca topên dagîrkeran`

Elî di dewama axaftina xwe de wiha got: "Melka xwîşka min ya 30 salî û dayîka min Fesla ya 60 salî jiyana xwe ji dest dan. Min cenazeyên wan li pêşiya xwe dîtin û ez matmayî mam. Rasterast top avêtibûn wan, laşên wan şewitîbûn. Derbarê birînan de jî Elî Ehmed ev agahî da: "Ez ji zik, pişt û lingên xwe birîndar bûm. Hevjîna min Roza jî ji çav û lingên xwe birîndar e. Keça min Cûdî jî ji dest û li lingên xwe birîndar e. Kurê min Ehmed jî ji lingên xwe birîndar e. Herwiha keça min ya mezin Cûrî ji zikê xwe birîndar e û parçeyeke tope nêzî kezeba wê bûye.

# Li Qamişlo 135 şehîd hatin bîranîn



**Meclisa Malbatên Şehîdan û malbatên şehîdan yên Qamişlo 135 şehîdên meha Mijdar û Kanûnê yên ku li cih û salên cuda di berxwedana li hemberî DAIŞ û dewleta tirkî de şehîd bûyîn, bîr anîn.**

Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişloyê bi merasîmekê 135 şehîdên di mehên Mijdar û Kanûnê de di sal û cihên cuda de di berxwedana li hember DAIŞ û êrişên dewleta Tirk a dagirker li çiyayên Kurdistanê de şehîd bûne, bîr anîn.

Merasîm li goristana Şehîd Delîl Saroxan a li Qamişloyê li dar ket. Bi dehan şênî û malbatên şehîdan tev lê bûn.

Di merasîma bîranînê de, endama Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişloyê Necah Gulo axivî û hemû şehîdên azadiyê bi bîr anîn.

Necah destnîşan kir ku ji bo pêkanîna armancên şehîdan ên di oxira wê de şehîd bûne, divê asta têkoşînê were bilindkirin. Her wiha Necah gotineke rêber Abdullah Ocalan bi bîr xist û got: "Rêbertî her tim digot, heke hûn aşiqê şehadetê nebin, hûn nikarin serkeftinê pêk bînin û têkoşînê berdewam bikin. Ez di wê baweriyê de me ku rêya şehîdan rêya serkeftin û azadiyê ye."

Necah diyar kir ku ji êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî sivîlan diyar dibe ku dewleta Tirk zaîf ketiye lê di heman demê de Necah got ew ê axa şehîdan bernedin û dê têkoşînê berdewam bikin.

Di dawiya merasîmê de wesîqeyên şehadeta şehîdan hatin xwendin.


***ANHA***

# Dagîrkeriya tirkî 4 ciwan ji Efrîna dagîrkirî revandin

**Istixbarata dewleta tirkî ya dagîrker careke din 4 welatî ji gundê Maratê yê girêdayî navenda kantona Efrînê ya dagîrkirî revandin.**

Çavkaniyan ji Efrîna dagirkirî ragihand ku istixbarata dewleta tirkî a dagirker bi ser malên gundiyên Maratê yê girêdayî navenda kantonê girtin û 4 welatî revandin.

Çavkaniyan navên welatiyên ku hatine revandin eşkere kirin; Elî Mihemed Îbrahîm (26), Mihemed Ehmed Eyûbî (27), Hemyar Mihemed Qilêc (27) û Dilyar Betal Betal (27).




Çavkaniyan destnîşan kir ku beriya niha jî istixbarata dewleta Tirk a dagirker her çar ciwan revandibûn û li beramberî hezar lîreyê tirk serbest hatibûn berdan.

Her wiha çavkaniyan diyar kir ku istixbata her çar ciwan birin navenda istixbaratê beyî ku çarenûsa wan bê naskirin.

***ANHA***

# Şêx û rûspiyên Til Temir herêmê êrişên dewleta tirkî şermezar kirin



**Şêx û rûspiyên eşîrên bakur û rojhilatê Sûriyê li navçeya Til Temir êrişên dewleta tirkî yên li ser navçeya Til Temir û Zirganê şermezar kirin.**

Bi dehan şêx û rûspiyên eşîreyên herêma Cizîrê, oldar û şêniyên Til Temirê li ser rêya navçeya Zirganê li nêzî baregeha Rûsyayê ya li bakurê navçeya Til Temirê kom bûn û der barê êrişên li ser her du navçeyan daxuyaniyek da. Daxuyanî ji aliyê şêxê eşîra Omera Mihemed Tahir ve hate xwendin. Daxuyanî wiha ye: "Ji Koalisyona Navneteweyî, Rûsya, Meclisa Ewlehiyê ya NY`yê, rêxistinên mirovî û hiqûqî re em dibêjin ku bi navê şêx û rûspiyên eşîrên herêma Cizîrê bi hemû pêkhateyên wê sûcên bêyî dermirovî şermezar dikin.

Tevî hebûna peymanên agirbestê, ev êriş zilm, dagirkerî û teror e .

Em sersaxiyê ji malbatên kesên ku di encama êrişên artêşa Tirk de şehîd bûne dixwazin. Dewleta Tirk bi van êrişan armanc dike tirsê bixe dilê şêniyan.

Şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dev ji xaka xwe bernadin û bi hemû hêza xwe dê parastina herêmên xwe bikin. Em bang li civaka navneteweyî û hêzên garantor dikin ku êrişan û rijandina xwîna şêniyên herêmê rawestînin. Her wiha hemû herêmên ku bûne çavkaniyan terorîstan li şêniyên wê vegerînin."

***ANHA***

# Fikrê Rêbertiyê ji tevayiya gelên bindest re riya rizgariyê ye

**Hevserokê Giştî yê OHD got, rewşa girtîgehan pir xerab e, dermirovî û ne qanûnî ye. Jixwe li girtêgehên Tirkiyê yan stûxwarkirina ji dewletê re yan jî işkence û kuştin derdikeve. Bi taybetî li ser girtiyên nexweş mirin tê spandin.**

**Serbest Etê /Qamişlo**



**`Li Tirkiyê civak tê darizandin`**

Li ser rewşa girtîgehên dewleta tirkî ya dagêrker Hevserokê Giştî yê Komeleya Hiqûqzanên Ji Bo Azadiyê (OHD) Binyamîn Şekir ji ronameya me re axivî.

Hevserokê Giştî yê OHDê sedemên vê polîtîkayên dewletê yên li girtîgehan anîn ziman û wiha got : “Dewleta tirkî bi polîtîkayên xwe yên qirêj, dixwaze kesên teslîm nabin û ji bo mafên xwe têdikoşin, ji holê rake. Çalakvan, siyasetmedar û her muxalifî destgîr dike. Dixwaze tirs û teslîmbûnê bi ser civakê de bispîne. Nehêle ti kes li hemberî wê serî rake. Wisa diyar dibe ku kesên têkoşer yan destgîr dike, yan dikuje yan jî dersînor dike.”

Binyamîn herwiha diyar kir ku pêvajoya li Tirkiyê pir xerab e got, êdî li Bakur û Tirkiyê pêvajoya darizandina civakê dest pê kiriye. Ewleyiya gel nemaye. Wisa bûye ku avayiyên herî zêde bi destê dewletê tên avakirin, girtîgeh in.

**`Li girtêgehan yan teslîmbûn ji dewletê re yan jî kuştin`**

Derbarê rewşa girtîgehan de Hevserokê OHD ev agahî da “ :Kesên siyastmedar, azadîxwaz û çalakvanên ku nikare li derve serî li wan bitewîne û bikuje, di girtîgehên xwe de polîtîkayên herî qirêj bi ser wan de disepîne. Eger girtî teslîmbûnê nepijirîne dikuje. Ji ber wê têkiliyên girtiyan bi malbatan re qut dike. Ji mafên xwe yên şandina nameyan, TV û rojname li wan qedexe dike û bi heman rengî xwendina pirtûkan heta werziş û danûstendin tên qedexekirin.”

**`Berxwedana herî mezin li girtîgehan e`**

Li ser berxwedana li girtêgehan Binyamîn ev nirxandin kir: “Bi rastî li girtîgehan berxwedan û têkoşîna herî mezin tê kirin. Ji ber wê dewlet ditengije, dibêje tevî vê zor û zilmê li girtîgehan çawa berxwedan û têkoşîn didome û nikare wan teslîm bigire! Ji ber wê her ku diçe li girtîgehan polîtîkaya qirêj dijwartir dike. Bi vî rengî sala 2020an sûc û binpêkirinên mafên mirovan di nava zagonên xwe de bi cî kirin û wan weke zagon dide xuyakirin. Çi exlaqî, çi hiqûqî ji her alî ve binpêkirin dibin. Li kû berxwedan hebe li wir sûc û binpêkirinan zêde dike.”

**`Sûcdar û kojer dewlet bixwe ye`**

Hevserokê OHD di heman demê de teqez kir ku li girtîgehan niha sûc ji her demê pirtir û dijwartir bûne. Herwiha tîpên nû yên girtîgehan û hucreyên yekkesî zêde bûne û axaftina xwe wiha domand :”Di nava girtiyên siyasî de kesên sûcdar, çeteyên DAIŞê tên bicîkirin. Dewletê herwisa navê kuştinê kiriye xwekuştin. Li her qawîşê kamîrayên şopandinê hene. Sûcdar û kujer bi her awayî dewlet bixwe ye. Ji ber wê pêwêstî bi lêkolînên kûr ji dozgeran tê xwastin. Li gorî helwesta dewletê eşkere ye ku bi fermana wê bixwe ev sûc li girtîgehan tên kirin.”

**`Bi sedan nexweş di binê işkenceyê de ne`**

Hevserokê Giştî yê OHDê herwisa da zanîn ku bi sedan girtiyên nexweş yên bêtedawî, li girtîgehan hene. Hem wan tedawî nakin, hem di qawîşên yekkesî de tên cezakirin û axaftina xwe wiha qedand: “Ji ber vê işkenceyê di nava hefteyekê de, Gerîba Gezer, Halil Guneş, Ebdurrezaq û Salih Turgut jiyana xwe ji dest dane. Herwiha bi sedan yên weke Mihemed Emîn Oskan hene, ku rewşa wan ya tenduristiyê pir xerab e û ji aliyê dewletê ve tên işkencekirin. Raporên nexweşxaneyan dibêjin ev girtî nikarin li girtîgehan bimînin. Lê Tiba Edlî bi biryara xwe mirinê bi ser wan de disepîne. Ev mirin ne xwezayî ne û ne jî xwekuştin in, dewlet wan dikuje. Bêguma idîayên xwekuştinê ne rast in û kujer dewlet e.”

# ‘Bi zindîkirina DAIŞê dixwazin herêmên dagîrkirî fireh bikin’

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Mihemed Emîn : Vîn û berxwedana gelên bakur û rojhilatê Sûriyê ji dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê mezintir e.

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê, bi sedê salan e ku dagîkeriya Tirkiyê li ser van gelan polîtîkaya qirekirinê dimeşîne û gelek sûcên li dijî mirovayiyê kirine. Dewleta tirkî ya dagîrker di rojên dawî de, ji bo ku kirîza xwe ya navxweyî pîne bike, li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê êriş û gefên xwe zêde kirine.

Li ser kiryarên dewleta tirkî ya faşîst û erişên wê yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Mihemed Emîn Elîko ev nirxandin kir: “Gef û êrişên dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bênavber didomin. Dema ku hikûmeta AKPê ya faşîst rastî krîzên hundir tê, dest bi êrişên herêmên Rêveberiya Xweser dike. Di rojên dawî de êrişên dagîrkeriyê yên ser navçeya Til Temir û Zirganê zêde bûne. Herî dawî di encama êrişên dagîrkeriyê de çar welatiyan jiyana xwe ji dest da û gelek birîndar bûn. Ji serdema Osmaniyan û heta roja îro, dewleta tirkî qirkirina gelan ji xwe re kiriye mîras. Ji ber ku di mehên borî de, siyaseta dagîrkeriyê li tevayiya qadan têk çû, hikûmeta AKPê dixwaze bi êrişên ser bakûr û rojhilatê Sûriyê xwe bigihîne hin armancan.”

Bi her rêbazê hewil didin Projeya Neteweya Demokratîk pûç bikin

Elîko da zanîn ku ji bo têkbirina projeya Neteweya Demokratîk, dagîrkeriya tirkî wê serî li her rêbazê bide û axaftina xwe wiha domand : “Ji ber berxwedana gelên herêmê, dagîrkerya tirkî wê nikaribe bi hêsanî êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bike. Lê metirsî hê jî berdewam e. Gefên dawî yên dagîrkeriyê di asteke bilind û cidî de ne, ji bo wê jî amedekariya xwe kirine.”

Dagîrkerî hewl dide çeteyên DAIŞê ji nû ve zindî bike

Elîko bal kişand ser girîngiya yekîtiya gelên herêmê li hemberî êriş û gefên dagîrkeriyê tirkî û axaftina xwe wiha domand: “Pêwîst e gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tev cihê xwe di nava berxwedana azadiyê de bigirin. Dagîrkeriya tirkî ji bo tevayiya gelên herêmê û Rojhilata Navî xeter e. Ji bo zindîkirina çeteyên DAIŞê, çeteyên xwe yên li Libiya û Azerbaycanê bi hêz dike û karta penaberên Sûriyê li dijî Ewropa bi kar tîne. Lê wê yekîtiya gelan bikare hewldanên dagîrkeriyê têk bibe û dagîrkeran ceza bike.”

Dixwazin dagîrkeriyê fireh bikin

Elîko têkildarî dijminatiya dewleta Tirkan bi gelên resen re û rêbazên wê yên qirkirinê wiha axivî: “Bi armaca tinekirina gelên resen, dewleta tirkî serî li her rêbazê dide. Bi taybetî gelê Kurd dike amanca êrişên xwe û li hemberî wan planên qirêj zêde kirine. Pêwîst e gelên herêmê hişyar bin û bi şerê taybet neyên xapandin.”

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), Mihemed Emîn Elîko di axaftina xwe de ji bo xerabkirina planên dagîrkeran ji gelên herêmê xwest ku ji têkoşîna azadiyê re bibin destek û axaftina xwe wiha qedand: “Ji gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tê xwestin ku dijminê xwe nas bikin. Herwiha li destkeftiyên xwe yên şoreşê xwedî derkevin û tevlî nava berxwedana azadiyê bibin. Yekîtiya gelên herêmê wê dagîrkeran ji holê rake.”

## Şerê taybet çima pûçkirina civakê dike amanc

**Mihemed Xanim**



Li hemberî her şêwaza tekoşîn û berxwedana gelan, ji bo bêbandorkirin û bêîradekirina civakê herwiha guhertina îdeolojiya wê, şerê taybet bi amûrên serdestî û zordariyê li ser civakê tê meşandin.

Şerê taybet bi gelek navan tê naskirin (şerê psîkolojîk, şerê sar, şerê nerm, şûştina mêjî û hwd.).

Dema gotina şer tê gotin xwîn, dijwarî û kuştin tê bîra mirov, lê şerê taybet berûvajî wê ye, li rex şidetê û dijwariyê fîzîkî her rêbazê bi kar tîne û ev jî mirov dixe xefkê. Lewr nizane şerek li ser tê meşandin. Ji ber wê gelek caran ew bixwe dibe amûrê xizmeta armancên dijimin.

Dîroka pêkanîna rêbazên şerê taybet ne nû ye. Lewra şerê li hemberî xistina mêjî û kolekirina mirov, xwediyê dîrokeke kevnar e. Lê em dikarin bêjin ku ev şer rêbaz û şêwazên xwe li gorî merc û rewşên wê serdemê diguherîne. Piştî her du şerên cîhanê ku bi milyonan mirov bûn gorî. Dewletên kapîtalîst dîtin ku wê nikaribin beramberî hêz, vîn û îradeya gelan temenê xwe bi şideta fizîkî dirêj bikin; serdestiya xwe bisepînin û berjewendiyên xwe bi dest bixin. Ji ber wê amûrên ku mirov bi kar tînin weke zanist, teknîk, spor, tendirustî, zayendî û hwd. tev kirin binê kontrola xwe.

Dewletên kapîtalîst, ji bo guhertina mêjiyê mirovan, dûrxistina wan ji armanca wan ya sereke û mijûlkirina wan bi tiştên bêwate, şerê taybet pêş xistin.

**Projeya Biratiya Gelan Ji Dagîrkeran re bûye tirs**

Dewletên kapîtalîst, ji ber ku naxwazin herêmên bi firka neteweya demokratîk tên birêvebirin pêş bikevin û bighîjin astekê xurt, hewl didin li wan herêman şer derxin. Rêbaza Şerê Taybet destwerdana yekser nake, gelan bi hev dide şerkirin, civakê ji hev dixe, biçûk dike, ji exlaq û çanda wê dûr dixe û parçe dike.

Rêveberiya Xweser ku bi Projeya Neteweya Demokratîk herêmê bi rê ve dibe, dikare tevayiya nakokiyên di nava civakê de çareser bike û di nava civakê de hevgirtineke bihêz çêke. Lê ev nakeve xizmeta dewletên kapîtalîst. Ji ber wê bi her şêwazê dixwazin li hundir nakokiyan derxin.

Eger kesayet û civak ne xwediyên îdeolojiyeke kûr û xurt bin, wê bi hesanî bikevin binê bandora şerê taybet. Eger gelên herêmê bi projeya Neteweya Demokratîk ne bawer bûna, wê bixwe bibûna amûrên pêkanîna armancên dijmin.

Rêber Apo dibêje; Ji baldariya ser dijmin pirtir, min jiyana xwe û dema xwe her tim da avakirina kesayetên îdeolojîk û azad. Lewra ku tu kesayeteke sazkar û îdeolojîk ava bikî, wê dijimin pê nikaribe.

Şoreşa gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, şoreşeke exlaqî ye û armanca wê avakirna kesayet û civakeke wekhev, demokratîk û azad e. Ev jî ne li gorî berjewendiyên hêzên serdest e. Ji ber wê di nava civakê de kar dikin û hewil didin ku ji exlaq dûr bixin. Ji bo gihatina vê armancê di bi riya fihûşê û belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de û gelek rêbazên din bi kat tîninş. Herwiha vîrûsa Covid-19, projeya sîstemên kabîtalîst bû. Ji bo bêhêzkirin û xistina aboriya hin welatan û berfirehkirina desthilatdariyê bû.

Ji bo têkbirina amûrên şerê taybet, pêwîst e gel Şerê Gel yê Şoreşgerî bimeşîne. Ji zarokan heta ciwanan, divê her kes ax û rûmeta xwe ji xeterê biparêze, meşeleya şoreşê rake, beşdarî parastina destkeftiyên şoreşê bibe û têkoşînê bike parçeyek ji jiyana xwe. Herwiha di milê îdeolojîk de xwe xurt bike, bi rêxistinkirî be, bi civaka xwe re hevgirtî be û itîfaqên gelên herêmê bihêz bike. Bi taybet li hemberî planên dijmin û neyarên demokrasiyê.

Bi vî rengî gelên azadîxwaz wê serkeftinê bi dest bixin û dijminê xwe yê nijadperest û faşîst têk bibin.

Heta ku gel negihîjin azadiya xwe, wê şoreş û şer dewam bikin.



# Omer Ocalan: Dixwazin bi tecrîda girankirî birêz Ocalan ji rojeva gelan derxin

**Tecrîda li ser Rêber Ocalan li girtîgeha Îmralî ku ji 99an ve dest pê kiriye, îro bi şêwazeke giran û dermirovî didome. Li ser mijarê Omer Ocalan got, gelê Kurd bi fikir û ramanên birêz Ocalan bûye xwedîhêz. Ji ber wê li Îmralî bi armanca dûrxistina gel ji Rêber Ocalan, konsepta tecrîda girankirî tê kirin.**

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**



**`Di sîstema li nava girtîgehê de girtîgeh û di nava tecrîdê de tecrîd, pêş dikeve `**

Derbarê tecrîda li Îmralî de Parlementerê Partiya Gelan ya Demokratîk (HDP) Omer Ocalan ji rojnameya me re axivî.

Omer Ocalan destpêkê tecrîda li dijî pîvan û zagonên mafên mirovan şermezar kir. Herwisa teqez kir ku piştî pêvajoya çareseriya demokratîk ya pirsgirêka kurdî, rejima tirkî konsepeteke nû xist dewrê ku bi her awayî têkilî û agahî ji Îmralî qut kirin. Omer Ocalan di dewama axaftina xwe de ev nirxandin kir: “Di vê pêvajoyê de sîstemeke ku di nava girtîgehê de girtîgeh, di nava tecrîdê de tecrîd, ji aliyê dewleta dagîrker ve hatiye avakirin. Bi giranî armanc ji vê sîstemê, qutkirina têkiliya birêz Ocalan bi tmamî ji gel, malbat, parazêran û tevgerên siyasî ye. Ji wê demê ve giranî daye wê ku birêz Ocalan ji rojeva Kurdan û Rojhilata Navî derxe.”

**`Di siyaseta xwe de şkest, dixwaze tola xwe bi girankirina tecrîdê bistîne`**

Omer Ocalan bal kişand ser sedemê tecrîda girankirî û wiha şîrove kir: “Tevî êriş û projeyên qirkirinê, dewleta tirkî bi ser nakeve. Jixwe nirxandina tecrîdê, êrişên li ser Bakur, Rojava û Başûr qet ji hev ne qut in, bi hev ve girêdayî ne. Ziraviyên tecrîd, koçberkirina bi milyonan Kurdan, êriş û firehkirina dagîrkeriyê bi konsepta dijberiya gelê Kurd tê kirin. Ji ber ku di siyaseta xwe de bi ser nakeve, tola şkestina xwe bi girankirina tecrîda distîne.”

**`Bi sîstematîk di girtîgehên dewleta tirkî de, mirov tên kuştin`**

Derbarê helwesta dewletên Ewropa de Omer Ocalan wiha axivî: “Di nêzîkatiyên li hemberî tecrîdê de xemsar in. Lêbelê biryara 2yê Kanûnê ya Konseya Ewropa girîng e. Lewra konseyê ji rejima tirkî xwest rewşa girtîgehan zelal bike. Bi giranî li ser zagonên darizandina hetahetayî ya giran (mûebed) jî hatin hişyarkirin -ku bi taybetî li ser girtiyên siyasî tê meşandin. Ev rewş konseya Ewropa nîgeran dike. Lewra tevlî zelalkirina rewşa girtîgehan, xwestiye guhertin di milê zagonan de bên kirin.”

Parlementerê HDPê da zanîn ku gelek dewlet, sazî û rêxistin şantajan li ser hesabê durişmên xwe dikin. Herwiha diyar kir ku CPT ji erkê xwe yên kontrolkirina girtîgehan dûr e û nirxandina xwe wiha domand: “Di encamê de li girtîgehan hem işkenceya fîzîkî, hem ya derûnî pir dijwar û bêsînor bûye. Ji ber wê bi sîstematîk di girtîgehên dewleta tirkî de, mirov tên kuştin. Pêwîst e CPT, Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropa û Konseya wê nirxên ku pê bang dikin biparêzin û xemsar nêzî rewşê nebin.”

**`Bi rêxistinkirina gel û xurttkirina parastina rewa wê tecrîd bê şkandin`**

Parlemeterê HDPê Omer Ocalan got, rejim ji gelê Kurd yê li her çar parçeyan bûyî civakeke polîtîk, ditirse. Ji ber wê armanca rejima Tirkiyê ew e ku vî gelî, di vê pêvajoya giran de bêrêber bihêle. Palementerê HDPê Omer Ocelan bi vê peyamê axaftina xwe qedand: “Di konsepta tecrîd û qirkirinê de ne gelê Kurd tenê, gelên din jî dike amanca xwe. Ji ber wê di serî de gelê Kurd ji tevayiya gelên azadîxwaz tê xwestin ku rol û têkoşîna xwe xurttir bikin, hêza xwe ya cewherî pêş bêxin. Jixwe bi vê yekê wê tecrîd bê şkandin û wê gelên Rojhilata Navî bikarin mafên xwe biparêzin û azadiya xwe bi dest bêxin.”

# Hisên Ezam: Yê ku sûdê ji girtina deriyên sînor digire, dijminê kurdan e

**Jiyan Ebas/Qamişlo**

**Hevserokê Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Hisên Ezam got, yê ku sûdê ji girtina deriyên sînor digire dijminê Kurdan e û yên ku rihê kurdewarî li gel wan hebe derî nagire.**



Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Hisên Ezam berxwedana dayîkên şehîdan û çalakvanên li deriyê Sêmalka silav kirin û wiha got: “Em dengê xwe tevlî dengê dayîkan dikin ku banga radestkirina cenazeyên şehîdên xwe dikin.”

Li deriyê sînor yê Sêmalka çalakiya dayîkên şehîdan û gelê bakur û rojhilatê Sûriyê ya ji bo girtina cenazeyên gerîlayên 28’ê Tebaxê bi destê çekdarên PDK’ê şehîd bûyîn, di roja 84an de dewam dike. PDK li şûna ku bersiva banga malbatên şehîdan û gel bide, deriyên sînor yê Pêşxabûr û El-Welîd girtin.

Rêveberiya Deriyê Sêmalka 19’ê Kanûnê di civîneke çapemeniyê de got, PDK’ê bi hinceta lidarxistina çalakiyan derî girtine.

Têkildarî mijarê Hevserokê Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) Hisên Ezam berxwedana dayîkên şehîdan û çalakvanên li deriyê Sêmalka silav kirin û wiha got: “Em dengê xwe tevlî dengê dayîkan dikin ku banga radestkirina cenazeyên şehîdên xwe dikin.”

Hisên Ezam bîr xist ku di qanûn, pîvan û exleqê şer de jî nabe ku aliyek cenazeyên aliyê din desteser bike û got, divê PDK li hemberî gelê Kurd rêzdar be.

**“Girtina derî kiryarekî ne exleqî ye’**

Hisên li ser siyaseta PDK’ê ya girtina deriyê Pêşxabûr û El-Welîd wiha got: “Girtina deriyê Sêmalka ji hêla hikumeta herêma Kurdistanê ve kiryareke ne exleqî ye. Diviya ne bi vî rengî, bi diyalogan nakokî bên çareserkirin.”

Ezam diyar kir ku herêmên Rojavayê Kurdistanê ji her alî ve dorpêçkirî ne û got, derdora me bi newaleke guran hatiye dorpêçkirin, deriyên sînoran hemû girtî ne, dewleta tirkî ya dagîrker siyaseta gefan bi kar tîne û girtina derî zirarê dide gelê me.

Hisên got divê deriyê Sêmalka/Pêşxabûr bilez were vekirin û wiha dewam kir: “Ez bawer dikim ku kesê ruhê kurdewariyê li gel hebe deriyan nagire.”

**“Ev kiriyar dikevin xizmeta dijminên Kurdan’**

Hevserokê MSDê Hisên Ezam da zanîn ku kiryarên PDK’ê di radeya yekê de dikevin xizmeta dijminê gelê Kurd û bandorê li têkiliyên kurdistanî dikin û wiha pê de çû: “Di demekê de ku gelê Kurd li hemberî êriş û gefên dijmin e, divê em li ser parastina rûmeta gelê xwe û çareserkirina nakokiyên heyî bi riya diyalogê nîqaşa bikin.”

Ezam got, yê sûdê ji girtina derî digire dijmin e û divê em Kurd rê li pêşiya dijminê xwe bigirin.

Hevserokê MSDê Hisên Ezam di dawiya axaftina xwe de got, deriyê sînor, deriyekî mirovî ye û xwediyê wateyeke neteweyî û kurdistanî ye. Lewra du parçeyên Kurdistanê bi hev re girê dide. Ji ber wê divê em parastina vê bikin.”



## Li zîndanan hiqûqa dijminatiyê

**Faruk Sakik**

Mêtîngeriya tirkî li zîndanan li hember Kurdan politîkayên taybet dimeşîne. Di dîrokê de zîndan her tim wek navenda tolgirtin, qirkirin û tunekirina Kurdan hatine bikaranîn. Bi îşkenceyên mezin dixwestin vê siyaseta xwe bibin serî. Di roja me ya îro de jî zîndanên dewleta Tirk ji bo girtiyên siyasî yên kurd bûne êşkencexane.

Di îstatîkên Konsêya Ewropa de li gor nifusê herî zêde li zîndanên Tirkiyê girtî henin. Giraniya van girtiyên siyasî jî ji ber doza Kurdistanê di girtîgehan de ne.

Dewleta Tirk gelek caran hiqûqa navnetewî û hiqûqa xwe binpê dike. Edalat û hiqûq ji bo wan 2 peyvên bê watene. Her tişt li ser sekna dijminatiyê hatiye honandin.

Di dîroka Kurdistanê de her ku serhildan pêkhatine em dibînin ku fînal li zîndanan bi darvekirina dawî buye.

Komara Kurdistanê bi darvekirina Qazî Muhamed, Serhildana Şêx Saîd bi darvekirina wî û Serhildana Dersim jî bi darvekirina Seyîd Riza bi dawî bû. Piştî van darvekirinan me dît ku careke din ev serhildan ji nû ve destpênekirin.

Ev mînak ji bo mêtîngeriya Tirk azmûnên serkeftî bûn. Dixwestin di hemû pêvajoyên berxwedana Kurdan de vê yekê bikar bînin. Dema ku serhildanan destpê dikir wan jî li zîndanan dest bi amadekariyan dikir.

Lê di serhildana PKKê de ev yek nebû. Ev taktîkên wan bi ser neketin. Piştî darbeya 12’ê Îlonê dest bi girtina çiqas pêşeng û kadroyên PKK’ê hebûn kirin. Li du şopa wan bûn. Dema ev kadro û welatparêzên nezî PKK’ê hatin girtin êdî qonaxek nû destpê kir. Digotin doza Kurdistanê di kesayeta van kesan de wê li zîndanan bi dawî bibe. Digotin ew siyaseta qirkirina Kurdan, ku bapîrên me dane destpêkirin, wê ev car bigihîje armanca xwe.

Lê, hin pêşengên PKK’ê yên wekî Mazlum Dogan, Kemal Pîr, M. Hayrî Durmuş, Ferhat Kutay li hember van politîkayên mêtîngeriya Tirk dest bi berxwedaneke dîrokî kirin. Şehîd bûn jî lê bi tu awayî rê nedan ku faşîzm bi serkeve. Berovajî berxwedana wan bû sedem ku PKK rojek zû dest bi şerê çekdarî bike û heta roja me bîne.

Di roja me de ev mîrasa siyaseta li zîndanan ên dewleta Tirk AKP’ê girt ser xwe. Li Tirkiyê li ser hev girtîgeh hatin çêkirin û çiqas siyasetmedarên kurd hene li van girtîgehan tejî kirin. Her ku hejmara girtiyan zêde dibû, zîndanek nû jî lê dihat zêdekirin.

Îro bi sedhezaran girtiyên siyasî li zîndanên Tirkiyê de hene û ji vana sedî 90 ji ber doza Kurdistanê hatine girtin.

Di salên 90’î de yên dîl hatin girtin bi cezayên mezin li gorî hiqûqa xwe ya metîngeriyê di zindanan de ew ragirtin.

Dema ku di 2015’an de Faşîzma AKP’ê li dijî Kurdan ji nû ve şer da destpêkirin, çete û eskerên wan ber bi çiyayê Kurdistan, kontra û polîsên wan jî ber bi malên siyasetmedarên kurd ve ketin tevgerê.

Serî de HDP’ê, endam û rêveberên saziyên kurdan yên demokratik hemû di hedefa wan de bûn. Bê lêpirsn bi hiqûqa dijminatiyê dîl hatin girtin.

Îro li zîndanên dewleta Tirk li dijî girtiyên siyasî êrişeke bi pîlan di rojevê de ye. Li ser girtiyên siyasî û nexweş zilmeke zêde heye. Tevî cezayê mêtingeriya Tirk li wan biriye qediyaye jî, bi hincetên cuda, înfazên wan bi awayekî kêfî tên şewitandin û nayên berdan.

Her roj agahiyên şahedeta girtiyan tê. Gelek caran sedemên van mirinan jî cûda tên nîşandan.

Her zîndanek veguherandina malên mirinê. Ev siyaseta dewleta Tirk ya li ser girtiyan li ber çave mirovahiyê pêk tê. Herkes bêdeng e. Welatên Ewropa û Amerika daxwazên rewa yên Kurdan nabîhîzin û pêşî li terora dewleta Tirk nagirin. Lê kurd û hêzên demokratîk, ji bo midaxeleyî vê pêvajoyê bikin pengaveke nû dane destpêkirin.